



Bernameya "Salute" Zanyarî ji bo beşdaran

Pêşniyaz	<p>Xaça Sor a Bazêl Lendê (SRC BL) bi dû kesekî peywendîdar ji bo te ye. Ev kes dê bi te re bi Zimanê Almanî biaxive û navçeya xwecihî û her tiştê ku te raberkirin dê nîşanî te bide. Ev kes wek xwebexşek e, yanî ti destheqekê wernagire.</p> <p>Kesê peywendîdar her wiha dikare alîkariya te di lêgerîna fêrbûna kar yan şixulîne, spartek an jî têgihîştina nameyan bike.</p> <p>Di şert û mercên dijwar de eger hest dikî ku piştrast û dilniya nînî, dikarî digel karmendê SRC BL'ê biaxivî. Eger te hejmara telefonê ya navnîşaneke nû heye, ji karmendên SRC BL'ê re ragihîne.</p> <p>Tu yê sozdarê lihevkerinên pêkhatî (qanûnbûn, raçavkirina dem û wextê, girêbestên têkildarî naverokê) bî.</p>
Civîn û heyam	<p>Tu yê her 7 an 14 rojan carekê bo heyama 1-2 saetan digel kesê peywendîdar hevdîtîne pêk bînî. Ev piştevanî dê ji 3 heta 12 mehan were domandin.</p> <p>Tu yê dem û cihê hevdîtîne digel kesê peywendîdar rêk bixî û hûn ê li ser wê li hev bikin.</p> <p>Eger hevdîtîneke guncan nine, herî kêr rojekê beriya hevdîtîne digel berpîrsê peywendîdar ragihîne.</p> <p>Tu dikarî civîn û hevdîtînan di her demekê de rawestînin. Karmendê SRC BL'ê haydar bike.</p>
Pêvajoyê	<ul style="list-style-type: none"> • SRC BL dê karmendekî peywendîdar ji bo te bibîne. Dibe ku ev yek ji çend hefteyanheta çend mehan dem bibe. • Karmendê SRC BL'ê dê beşdarî yekem hevdîtîne bibe. • Çar hevdîtînen yekem dewreyeke ceribandîne ye. Karmendên SRC BL'ê piştî wê yekê dê digel te têkilî dayîne û ji te bipirse ku gelo hevdîtîna û civîn bi başî bi pêş ve diçin an na.
Lêçûn	<p>E pêşniyaz belaş e. Eger tu û berpîrsê peywendîdar tiştêkî di hevdîtîna xwe de xerc bikin (wek mînak qehwe), wê çaxê her yek dê lêçûna xwe bide.</p>
Parastina daneyan	<p>Tu qebûl dikî ku berpîrsê peywendîdarê te dikare hin zanyariyan li ser te û civînan digel Karmendên SRC BL'ê û eger pêwîst bike digel Xizmetên Civakî (ORS AG, Convalere AG an jî pisporên din) parve bike.</p> <p>Berpîrsê peywendîdar zanyariyên te yên kesane dê digel ti kesekî din parve neke. Bi vî awayî, tu yê ti zanyariyeke kesane derbareyê berpîrsê peywendîdar parve nekî.</p>